

# Kîndirgartina Temenê Sê Salî

3-YEAR-OLD KINDER

Best Start

Best Life

Ji bo ku em xeyaleke mezin  
bikin, zarokên me hewceyî  
destpêka jiyanê herî baş in



**Hikûmeta Vîktoriya di deh salan de bi qasî 5 milyar dolar veberhênanê dike ji bo Kîndirgartinê Sê Saliyê finanskirî ya Navneteweyî û niha li seranserê wîlayetê heye.**

**Yanî saleke din ji hînbûnê û mezinbûnê û lîstinê û çêkirina hevalan ji bo zarokên Vîktoriya.**

Beşdarbûna di programa kîndirgartinê de di temenê sê salî, fêrbûna zarokan pêş dixê, tenduristî û saxlemiyê zêde dike.

**Zarokên biçûk bi riya lîstikê cîhana li dora xwe hîn dibin**

Fêrbûna li ser bingeha lîstikê ev e ku zarokên biçûk çawa çêtirîn fêr bibin. Derfetê dide zarokan ku xeyala xwe bi kar bînin, jêhatîbûna zimanê wan ava dike û li ser hejmar û nimûneyan fêr bibin. Ew herwiha hîn dibin ku çawa bi kesên din

re li hev bikin, parve bikin, guhdar bikin û hestên xwe bi rê ve bibin.

**Hemî zarokên li Vîktoriya dikarin du salên kîndirgartinê yê finanse kirî bi kar bînin**

Zarokên li seranserê wîlayetê wê ji sala 2022 'an sûtê werbigirin û her hefte herî kêr pînc saetan her hefteyê ji kîndirgartinê sê saliyê yê finanskirî. Saet wê heta sala 2029 'an hefteyê 15 saetan zêde bibe.

**Eger zarokê we biçê kîjan kîndirgartinê jî, mamoste û kesên jêhatî dê programê bi rêve bibin**

Zarok dikarin biçin programên kîndirgartinê ji bo rojeka dirêj (lênihêrîna zarokan) yan jî Kîndirgartinê normal

<b>Zarokên biçûk fêrî cîhanê dibin bi rêya leystokê</b>
<b>Ew fêr dibin ku mirov çawa li hev bikin bi kesên din re, parve bikin, guhdarî bikin, û hestên xwe birêve bibin</b>
<b>Di bernameyê kîndirgartinê de, zarok ji bo avakirina jêhatîbûnên ziman û fêrbûnê di derbarê hejmar û nimûneyan de, lîstikan bi kar tînin</b>
<b>Mamosta û fêrkerên alîkariya zarokan dikin ew mereqdar, afirîner û bi xwebawer bin di fêrbûnê de</b>

## Dibe ku bernameyên kîndirgartinê di mîhengên cûda de werin pêşkêş kirin

<p><b>Kîndirgartinên bi tena serê xwe</b></p>	<p><b>Bernameyên Kîndirgartinê</b> Zarok beşdarî bernameya kîndirgartinê dibin di roj û saetên diyarkirî de</p>
<p><b>Xizmetên Lênihêrîna ji Roja Dirêj</b></p>	<p><b>Programên Kîndirgartin</b> Zarok beşdarî kîndirgartinê dibe weke beşek ji dema lênihêrîna rojê ya dirêj e</p>
	<p><b>Perwerdehî û Lênihêrîn</b> Xizmetên Lênihêrîna Rojê ya Dirêj perwerdehîya zarokatiyê û lênihêrîna zarokên temen di navbera 0 û 6 salî de pêşkêş dike</p>

Divê hemî bernameyên kîndirgartin yê finanse kirî li gorî rêbernameyên ewlehî û kalîteyê yê hikûmetê û li gorî çarçoveya Fêrbûn û Pêşveçûna ya Salên Destpêkê ya Vîktoriya yê.

Navenda lênihêrîna rojê ya dirêj dikare rojek tijî perwerde û lênihêrîn pêşkêş bike, tevî programên Kîndirgartinê. Programên Kîndirgartinê yê bi rêveberiya mamoste, bi saetên din ên perwerde û xwedîkirinê re tê entegrekirin. Di xizmeteke bi tena serê xwe de, Programên Kîndirgartinê tenê dê di hin rojan û demên taybet de birêve biçê. Ew roj û saet ji aliyê servîsa Kîndirgartinê ve tên danîn.

**Biryara ku zarokê xwe bişîni ku derê girêdayî kîjan xizmetên di civaka we de hene, û çî ji bo malbat û zarokê we çêtirîn kar dike**

### Tomarkirina zarokê li Kîndirgartinê ya Sê Salî ya Navneteweyî

Li ser pêvajoya tomarkirinê û dema wan bi xizmeta xwe ya Kîndirgartinê ya herêmî re biaxive û serdana navend û xebatkarên wan bike. Ji bo dîtina Kîndirgartinê xwe yê herêmî û ji bo agahdariya li ser hilbijartina xizmeta rast a ji bo malbata xwe, serdana:

[education.vic.gov.au/choose-kinder](http://education.vic.gov.au/choose-kinder)

Hilbijartina servîsa Kîndirgartinê dê ji bo ku zarokek ji dema xwe bi awayêkî baş bi kar bîne li Kîndirgartinê. Hûn dikarin bi seredana li rêjên kalîteya xizmetê binêrin:

[www.startingblocks.gov.au](http://www.startingblocks.gov.au)

### Kengî dest bi Kîndirgartinê Sê Saliyê finanskirî ya Navneteweyî biki

Piraniya servîsan xwedan pêvajoyek navlêkirinê ne ku salek berî ku zarok programa kîndirgartinê dest pê bike vedibe, ji ber vê yekê divê hûn li ser tomarkirinê bifikirin ku dema zarokê we dibe du salî,

Malbat û kesên ku zarokên wan di navbera Çile û Nîsanê de ji dayik bûne dikarin hilbijêrin ku wê kîjan salê dest bi kîndirgartinê sê saliyê yê finanskirî ya gerdûnî. Malbat dikarin ji bo zarokên xwe hilbijêrin ku sala din tevî dibistanê bibin, lê dema ku zarokên din dest pê bikin, dê du salî bin.

**Zarokên ku di navbera 1ê Çile û 30yê Nîsanê de ji dayik bûnê** dikarin beşdarî Kîndîrgartina sê saliyê bibin di sala dibin sê salî yan di sala dibin çar salî de.

Dibe ku zarok nikaribin beşdar bibin di bernameyan de heta dibin sê salî ji ber xizmeta fêrker ku ji bo zarokên du salî dikin ne li gorî wan zarokan e

**Zarokên ku di navbera 1ê Gulanê û 31ê Kanûnê de ji dayik bûnê,** tenê di sala pêncan de dikarin biçin Kîndîrgartina Sê Salî di sala ew dibin çar salî de û Kîndîrgartina çar salî dema dibin pênc salî.

### Temenê destpêkirina Kîndîrgartinê

Dîroka zarok ji dayik bû ye	Şîrove	2020	2021	2022	2023	2024
21 'ê Kanûna 2016 - 30 'ê Nîsana 2017	Ji bo malbatan biryara destpêkirina dibistanê heye di sala 2022 an jî 2023	3 Kîndîrgartina Temenê se salî	4-Year-Old Kindergarten	Berî dibistanê (Prep)	Pola 1	Pola 2
1 Gulan - 20 'ê Kanûna 2017 *			3 Kîndîrgartina Temenê se salî	4 Kîndîrgartina Temenê se salî	Berî dibistanê (Prep)	Pola 1
21 'ê Kanûna 2017 - 30 'ê Nîsana 2018	Ji bo malbatan biryara destpêkirina dibistanê heye di sala 2023 an jî 2024		3 Kîndîrgartina Temenê se salî	4 Kîndîrgartina Temenê se salî	Berî dibistanê (Prep)	Pola 1
1 Gulan - 20 'ê Kanûna 2018 *				3 Kîndîrgartina Temenê se salî	4 Kîndîrgartina Temenê se salî	Berî dibistanê (Prep)

\* Meha Kanûnê têrmê dawî yê 4 di dibistana dewletê de. Eger di dibistana malbat bi kar tîne de têrma 4 zûtir bi dawî dibe, li wê demê ew dîrok dê bi kar bê.

### Kî dikare bersiva pirsên li ser Kîndîrgartina Sê Saliyê finanskirî ya Navneteweyî bike

- Kîndîrgartina we ya herêmi tev servîsa lênihêrîna rojên dirêj.
- komîta we ya herêmi an jî hemsîre dê û zarokan
- telefonî Wezaretê Tenduristiyê (DH) bikin
- xeta ji bo alîkariya dê û bavan 13 22 89
- Îmêl [3yo.kindergarten@education.vic.gov.au](mailto:3yo.kindergarten@education.vic.gov.au)

Seredana malperê bike [www.vic.gov.au/kinder](http://www.vic.gov.au/kinder)

